Wek tê zanîn zivstana sala derbaz bûy endameke keç a saziya me bi nawê " Sirwe Kamkar " ji aliya hêzên dewletê di nawa bajara mehabadê bi armnca qetil kirna wî hat rewandin û cerdewanek bi nawê " Rehman é tevî hejmarek hêzên ewlekarî dixwastin wî bikujin. Lê dema ku me hejmara maşîna Rehman û nawê wî peyda kir û me bi lez şikayet kir, hêzên dewletê neçar man ku Sirwe serbest berdin. Piştî re dîmen û wêneyê bedena tijî îşkence ya Sirwe li ROJ TV hat belav kirin u hejmarek jinên mehabadê bi taybetî daykên aşitî ketin nawa mîtîngekî ku ew jî rastî êrişan hatin. Piştî çend hefte Sirwe Kamkar di nawa PKK de bicêh bû. Ew yek jî zêdetir dewletê tengezar kir. Piştgîrîya min bi sirwe re bû sebeba acizbûna dewlet. Herweha hejmarek gotûbêjên min li ser henek meseleyên wek " Şiwane qadrî " û … bûne sebeb ku dewlet min bigre. Herweha endametiya min di nawa ajansa FİRATê jî bu sebeba ture buna dewlet û dewlet min bi nûçegehanî û şandina nûçe li dijî îran bo derweyê welat tawanbar dikir. Dema ku min girtin ez ketim nawa gireva birçîbûnê û di heman demê de gireva neaxfîn û bêdengî li hember hêzên dewletê. Ew yek jî bû sebeb ku ez li Mehabadê bibin zîndana tarî ya ewlekarî li Ûrmîye û li wê derê jî min gelek îşkence û zehmetî dîtin.

Gelek rêxistinên mafên mirovan, saziyên kurdî û kurdistanî, nivîskar û rewşenbîran piştgiriya we di zindanê de kirin, pirsa me ewe gelo geşbûna vê xebata demokrat a aştiyane di cîhanê de, çi nîşan dide?

* berê her tiştek ez gelek sipasîya wan kesan dikim ku piştgîrî ya min kirin. Bi taybetî radio u televîzyon û malperên kurdî, ajansa nûçeyan a Firat, rêxistina rojnamewanên bêsinur, PEN a Kurd û PEN a cîhanî û xelkê mehabadê… ez bi rastî xwe di wê demê de zêdetir berpirsyar dibînim ku layqê wan bibim û ez bawerim ku tenê bi zêdetir kirin û berfireh kirina kar û xebata xwe dikarim bersivek bidim piştgiriya wan. Ez bawerim ku me kurdan gerek ji bo pêşketina dêmokrasî û geheştin bi armncên xwe yên rewa di nawa xebatek berfireh di asta netewî û nawnetewî de bibin. Ji bo wê jî pêwîste ku di asta netewî de her kes xwe perwerde bike û em piştgîrî bidin hev û bi taybetî karê nûçegehanî û perwerde pêş bikewe. Eger em ji bo hevdû kar nekin, kes ji bo me naxebite. Gerek ez êş û elem û janê te bibînim û ji bo te hawar bikim û tu jî sibe ji bo min hawar bikî. A dûyem jî di asta nawnetewî de gerek em peywendî yên xwe bi saziyên nawnetewî yên serbixo yên mafê mirovan û saziyên dêmokratîk bihêz bikin û di asata ragehandinan de em dengê xwe bigêjînin cîhanê. Aniha di wê warê de kêmasî hene. Lê ez bawer im ku bi îradeyekî giştî û baş wê pêş bikewe.

_Hun dixwazin li ser rûpelên NEWROZÊ çi ji xwendevanan re bibêjin?.

* Ez tenê dikarim bêjim ku Newroz hêdî hêdî nêzî meye. Newroz pîroz dikim û baweriya me heye ku newroza serkeftinê jî nêziye. Silaw ji kawe yên hemdem. Silaw li welatê Newroz…silaw Newroz. Bi hêvîya ku em Newrozek bêsinur (ku sinur hatbin rakirin) li her 4 alîya welat bibînin…

_ Em we sipas dikin, hêvîdar in her serkeftî bin.

* serkeftin ji we re û ji hemî hêzên xebatkarên gel re